Da hêza dil û mejiyê jinê dîyar bikin

Meryem şêxmûs Eseed

Demê em reseniya mêyatiya jinê û siruştê wê wek jêderekî bo têkdanê dihêlîn, dilreşî bo me jê çêdibe, li wî demî em bi xwe valahiya deronî digirin, da em çavlêkirinê ji hindek saxletên ku digel regezê me yê ciwan û dahêner werbigirin dihevdij bin.

Husa em pêdivî hindek rêkên rasteqînene ku em pê jiyan bikin û xwe li hîviya çi piştevanan ne girin. ku werara civakî û pêkhata wî dibite tiştek hamşî, her weku çax wî paldide, neku ew çaxî paldid e.Ya veşartî nîne jî ku êk ji binemayên avakirina civakê, regezê mirovî yê mêye, lê erê em dişên rewşa valahî û nîgeraniya deronî ya jina rojhilatî têde dijît mandel bikin? Hestkirin bi tirsê û bêzarî û toşbûn bi riswakirin û nîgeraniyê û bawerî bi xwe nebûn, rewşên derunîne û digel qonaxên mezinbûna jinê, ew jî mezin dibin, eve di ser hemû hestên wê re, bi hukmê hevdijiya werara sistemê babsalarî bi berovajiya rewtê siruştî yê mê û eve her ji zarokîniyê were û heta digehite qonaxa pêgehiştinê. Bo nimûne, da derona wê kiçê şirove bikin ya hezdike hindek demên xweş di jiyana xwe de biborîne, ku bi bexteweriya hizir û hîvî û xeyalên wêve digirêday bin. Yan jî heta ew hindek pirsiyaran li ser jiyanê bike, dê bînî sizayê vê çendê dê ew bit ku bi çendeha roj û heyvan dê ji jiyana xwe bi riswayî borîne. Hosa li ser jinê hatiye çespandin ku çend carkî sizayê xwe bide beramber wî tiştê ew werdigire. Ew zîndiyeke ne bawerpêkiriye û ji ber hindê ew neşêt wî tiştê werdigire biparêz e û hosa jî dibite miroveka hamşî. Ev hemî ye jî bo kêm rewşenbîriya wê li ser regezê wê dizivire. Belku hindek jin retkirina wan taybetmendiya dikin yên bi wê ve di girêday, hosa ew dibite harîkar bo şêlandina wênê jinê di wan cudahiyên digel zelamî de heyin, çi bi merem yan bê merem, di ser hindê re ku ev cudahiye jêderê hêza jinêne ji layê hizrî û sozdarî û têgehştinê ve, belku heta ji layê pêrabûnên kiriyarî ve jî, jiber eve ye rasthêl û eve ye sirust. Binema û yasayên jinan yên resen hinekê ji me di dûr in, singên mejî valahiyek mezin keftiyê.Heta ku sozame jî ber bi dijwariyê diçe. Ew valahiya deronî, rêkê li ber hemû bi-

yaniyekî vedike ku li ser me zal be û em hemû fermanên wî bicih bînin.

Li vêderê divêt em lumeya ji kesê nekin, lê divêt em xwe bihêz bêxin û nehêlin her kes li ser me zal be ku tinê em fermanên wî bicih bînin û jiyana me araste bikit, jin nehewcey çi şîret û serbora nîne, belku li her cihekê hebe ew dişêt derona xwe rêk bêxe û kar û sozdariya xwe jî rêk û pêk bike, hosa bazineya karê wê dê berfireh be, çunku karê jinê ne tinê dibite jintî û dayiktî û bi xudankirina zarokan, belku şiyanên wê pitir in, heta divê mijarê de jî berêxwedaneke dî li xwe bike. Çunku jin divêt sehkete rêkên dahênanê di pêrabûnên karî de, çi li ser astê rewşenbîrî, civakî, yan jî sîyasî. Çunku digel guhorînên nû yên civak têde dibort û wênê wê nûyatiya çêdibe, ewa ev qonaxe pê bijare dibe, têde herkes bo rastvekirinan li dû mercên hevguncay toş dikin, bitaybet jî li ser astê jinan, ku di şiyande ye bêjine vî çaxî, çaxê (bihara jinan). Lewra û jibo ku xwe guncandinê digel siruştê biharê, havêtina pêngaveke dî ji wan dihête xwastin ku digel werzê biharê bigunce, çunku bihar bi xwe despêkirineka dî ye piştî zivistaneka sir û sar . Her dem jî, bo dîtina çareseriyan, li despêkê eger û hukar dihêne vekulan. Lê diser vî binikê asane re, gava her tişt girêday deronê mirov be û sizadana wî be, hîngê em xwe ji vî binikî vedidizin. Belê bi piştevaniyeka mînevî ya mezin, em dê bine senter û dê hemû baweriyê bi xwe zivirînin, belku danana bernamekê karî yê biçûk bibite palderekê asane ji bo despêkirina têkbizivînê digel jiyanê û bicih înana wan armancên em kar bo dikin û hîvî bicih bihên. Vêca heger te xwe bêzar dît û ji derona xwe ya razî nînî û ya dibînî ku ev rewşe li nik te dubare dibe, bizavê bike ku kar û erkên xwe nûjen bike, birêka guherîna kirina wan karan û behreyan xwe pêş bêxe û li jêderê xweşiyê bo xwe û xêzana xwe û cîranê xwe bigere û paşî bo gel û welat û netewa xwe û jibo vê xwe ji aliyê deronî û hizirî ve berihev bike û bi rijdî kar bo bike.û encamên karê xwe berçav bike û nebêje çi karên rasteqîne min nekirîne û aliyên nebaş û lawaz dest nîşan bike, bitaybet jî yên girêday xizmetkirina xelkî, ku ev cure kare hestkirineke mezin dibexşin û baweriyeke mezin didine mirovî û mirov digel xwe hêja û mezin dibîne. Hîngê dê hest kin ku em jêderê pişkdaryê ne di werarikirina civakî û mirovî de, divêt em jibîr nekin ku şaşî dê her hebin, lê divêt xwe ji sûça û şaştiyê bi merem dûrkin. Bizanin ku jin zîndewerekî bibihaye û dişiyanên wê de ye ava bikit. Ma çend jinan di dîrokê de dilê xwe û suzdariya xwe kirine yek û şer kirîne başî û dehbe kirîne mirov û ceng bo aştiyê guhertîne, dîrokê şanazî bi van jinan kiriye û navên wan di nav milletan de mayne sax, vêca da em jî bizavê bikin ku em ew hêla berdewam bin dinavbera van jinên navdar û vî çaxî de.